



Hejmar: 15, Cotmeh 2009 Kungens Kurva - Stockholm

**Dosya taybetî:
Hilbijartina li Herêma Kurdistanê û Mafê Mirovan**

**Amadekar
Gabar Çiyan & Mistefa Cizîrî**

Dosya taybetî: Hilbijartina li Herêma Kurdistanê û Mafê Mirovan

Gabar Çiyan & Mistefa Cizîrî

Hilbijartina li Başûrê Kurdistanê di 25 ê tîrmehê de pêk hat. Hilbijartina li perçeya azad, ne tenê bala me dikişand. Her wisa bala cîhanê jî dikişand. Medîa netewî û ya navnetewî elaqatek mezin nîşan da. Gelek welat, bi dezgehên cewaz anjî bi rêya şexsiyetan, roja hilbijartinê çûbûn Kurdistanê. Li ser hilbijartina li Kurdistanê analîz û rapor bi zimanên cewaz belav kirin...

Hilbijartina li Herêmê, bala partî û siyasetvanê swêdî jî kişandibû. Hejmarek kes ji Swêdê jî çûbûn Kurdistanê. Yek ji wan kesan jî Jabar Amin bû.

Jabar Amin li Swêdê siyasetvanek nasdar e. Di partiya keskan (Miljö Partiet) de dixebite. Wî, li Başûrê Kurdistanê çavdêriya hilbijartinê kir û pêşveçûnên dawiyê ji nêz ve şopand.

Me, bi siyasetvanê birêz Jabar Amin re li ser "Hilbijartina li Kurdistanê û Mafê mirovan li Herêma Kurdistanê" hevpeyvînek pêk anî. Em hevpeyvînê, bi forma raporekî pêşkêşî raya giştî dikin.

Jabar Amin

Siyasetvan Jabar Amin, 50 salî ye. Ji Başûrê Kurdistanê ye. Dewletnasî xwendiyê. Di rêvebiriya Partiya Kesk ya Swêdê de xebat kir. Di meclîsê de cîgir e. Li bajarê Umeå yê di dezgeha li dijî dîskîrîmînekirinê de rêvebir e. Zewicî ye û zarokên wî hene.

Hilbijartin

- Di dema hilbijartinê de gelek çavdêrên navnetewî li Herêma Kurdistanê bûn û hilbijartina li wir ji nêz ve şopandin. Hejmerek kes ji partiya we jî li wir bû. Qala dema serdana xwe ji me re bike: Mecalê we û hevdiîna kesên din pêk hat, an na? Bi giştî, gera we çawa derbas bû?

Jabar Amin: Ez, berî hilbijartina bi 5 rojan, 20 tîrmehê çûm Başûrê Kurdistanê. Li gorî plana xwe, em bi gelek kesan re rûniştin, axifîn. Çi asteng pêk nehatin. Gera me bi giştî baş derbas bû.



Wêne: Jabar Amin li cihê dengdayînê

- Li gorî rapora we ya li ser hilbijartina li Herêma Kurdistanê belav bûbû:
"Di encama hilbijartina sala 1992 an de, PDKI û PUK jî % 90 deng girtibûn. Lê nuha hejmara dengên wan jî % 58 e..."

Xelkê li ser kêmdeng girtina herdu hêzan, diîtinên xwe çawa dihanîn zimên?

Jabar Amin: Giraniya nîrxandinan, sedema têkçûnê, bi rexneyên xelkê yên li ser şeweya îdarekirin û polîtîka PDKI û PUK ê ve girê didin.

Xelkê, berî hilbijartinê qala vê rastiye dikir û wisa digotin: "Piştigiriya PDKI û PUK ê dê pir kêmtir bibe û ev rastî roja hilbijartinê, piştî jimartina dengên dê derkeve hole".

- Diîtinên rêvebir û piştgirên PDKI û PUK ê li ser qelsbûna hejmara dengên xwe çawa bû?

Jabar Amin: Piştî encama hilbijartinê diyar bû, gelek kes ji PDKI û PUK ê şok bûn û matmayî man. Lîsteya Goran jî % 25 dengên girt. Siyasetvanên rêvebiriye dikin jî şok bûn. Ji ber ku lîsteya Goran li gelek deverên Silêmanî, PUK ê li dawiya xwe hişt. Encama li wir

şoka PUK ê mezintir kir. PUK li ne li benda encamek wisa bû. Li gorî texmînên wan, hejmara dengên Goran dê ne zêdeyî ji % 1-3 bû.



Wêne: Deng têne hejmartin

- Weke kesek siyasetvan, dîtina te li ser encama hilbijartinê çi ye? Şaşîti çi bûn? Mirov çawa dikare wan rast bike? Pêşniyarên te çi ne?

Jabar Amin: Encama hilbijartinê pir eşkere nîşan dide ku xelk ji polîtîkayên PDKI û PUK ê ne memnûn in. Xelk bi giştî, ji rûşwet û polîtîka parastina berjewendiyên kes û xizman li herêmê ne memnûn in, vê yekê gelekî rexne dikin. Xelk pê bawer e ku, hatinên herêmê ne bi edalet tê belavkirin. Hikumeta Herêmê, PDKI û PUK nikarîbûn rê li ber “bê edaletiyê, rûşwetê û polîtîka parastina berjewendiya kesên nêz û hwd.” bigirin. Encamek wisa mezin ji ber helwêsta wan, polîtîka wan e. Pir dijwar e, ne hêsan e ku PDKI û PUK, şerê li dijî rûşwet û parastina berejewendiyên kesên nêz bike.



Wêne: Amin encamê dişopîne

Rewşa Kurdên Êzîdî



- Li gorî dezgehên Êzidiyan li Elmanyayê, Êzîdî, di Parlamentoya Kurdistanê de sê (3) niwênerên xwe hebûn. Lê nuha hejmara niwêneran daketiye kesekî (1). Li aliyekî kêmbûna dengên wan di parlamentoyê de, li aliyê din êrîşên ser herêma Êzidiyan zêdetir dibe...

Rêvebirên Herêmê di axaftinên fermî de, Êzîdiyan hebûn û bingeha kurdan nîşan didin. Li aliyê din niwênerên wan kêm dibin û parastina wan qelstir dibe.

Mirov çawa dikare rewşê baştir bike?

Jabar Amin: Mixabin e ku, li ser pirsê zaniyariya min tune ye, kêma e.

Mafê mînorîtetan

- Li ser encamên hilbijartina Herêma Kurdistanê gelek nivîs hatin navenda EuroKurd Human Rights-EHR û EuroKurd News ê. Hinek ji wan jî gazinên Asuriyan hemêz dikin. Niqaşa di organa Federasyona Asuriyan li Swêdê "Hujodo" jî yek ji wan e.



Di niqaşê de qala pêşketina demokrasîyê li herêmê bi erênî tê kirin. Lê li aliyê din, gazin ji PDKI û PUK ê tê kirin. Wan tesîr li prosesê kirine û piştgiriyek eşkere pêşkêşî hêza "Assyrian Chaldean Syriac Council" kirine. Bi rêya Ishtar Tv propaganda hatiye kirin ku dangan bidin wan. Di encama hilbijartinê de 3 kes ji Assyrian Chaldean Syriac Council" û 2 kes ji hêza Zawaa (Tevgera Demokratîk ya Asuriyan) ketine parlamentoyê...

Li ser hilbijartina li Herêma Kurdistanê, di Hujodo yê de Johannes Khawsho wisa dibêje:

"Ez hêvîdar im ku serokên kurdan û KDP vê yekê fêma bikin ku, mudaxeleya nav pirsên Asuriyan çî sûdê nagihêjîne kurdan û ne jî asuriyan. Divê bi taybetî kurda ji metodê wisa tecrûbe girtiba. Saddam Hisêyn bi xwe jî wisa kiribû, ji bo ku hêza kurda qels bike, hêzên bi xwe ve girêdayî di nava kurdan de ava kiribû.

Rêya herî baş ji bo fêmkirina kurd û asuriyan ew e ku, partiyên asuriyan azad bihêlin û têkilî nav xebatên wan nebin da ku ew niwênerên xwe bi azadî hilbijêrin".

Li ser pirsê zaniyariya te heye, an na? Mirov çawa dikare mafê mînorîtetan li Kurdistanê biparêze?

Jabar Amin: Zaniyariya me li ser pirsê heye. Li gorî zaniyariyan, PDKI û PUK dixwazin bandora xwe li ser berendamên mînorîtetan zêdetir bikin. Ji bo tesîrkirinê, piştgiriyê didin hinek lîste anjî berendeman...

Bi baweriya min, helwestên wisa şaş e. Divê mînorîtetên hene, bi şeweyekî azad berendamên xwe diyar bikin û hilbijêrin, bêyî zext li ser wan hebe. Pêwîst e mafê mînorîtetan gav bi gav, bi rêya guhertina qanûnên bingehîn, bê parastin. Divê rêvebirên hikumetê, xwe, ji zextdanîna ser wan û tesîra li ser lîsteyên wan dûr bigirin, bêalî bimînin.

Mafê Mirovan

- Xebata Hikumeta Herême li dijî îşkenceya di zindanan de, bi şeweyeke erênî didome. Lê li gorî nûçe û raporên digihêjin navenda me, li zindanan Herêma Kurdistanê îşkenceya li dijî girtiyên heye, didome.

Ev yek baweriyek wisa pêk dihêne: Beşek ji rêvebir û xebatkarên Asayîşa ku rêvebiriya zindanan dike, ji awira meslekî, perwerde û tecrûbeyan ve qels in û nikarin rêvebiriya karê zindanan bikin.

Dîtina te çi ye? Mirov çawa dikare rewşê bide guhertin ku helwest û kirinên neînsanî li zindanan bi dawî were?

Jabar Amin: Beşek rêvebirên herî bilind di sektora zindanan de, rêz û hurmetê ji mafê mirovan nagirin. Ev jî problema herî mezin e. Dema şefê polîsan, polîsên ewlekariyê û rêvebirên zindanan li ser pirsê cidî bin, îşkencê qedexe bikin, kesên îşkencekar bîndarê dadgeh kirin û ceze kirin dê îşkenceya li zindanan pir kêmtir bibe, dawî lê were.

- Li gorî îstatîstîkên li ber destê me, li başûrê welêt, ji % 60 keç û jin ji ber sunetkirinê seqet mane. Gelek dezgehên navnetewî nerazîbûna xwe anîne zimên û îro jî sunetkirina keçan û seqetmayîna wan didome. Lê sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê bi rêya qanûnan nehatiye qedexekirin.

Sunetkirina keçan sucek navnetewî ye ku li dijî keçên biçûk li Başûrê Kurdistanê didome. Mirov çawa dikare rê li ber bigire? Pêşniyarên te ji Hikumeta Herême re çi ne?

Jabar Amin: Ji ber ku li ser pirsê lêkolînê hene kêmtir in, anjî nagihêjin ber destê me, hayê min ji mezinbûna buyerê tune bû. Li gorî zaniyariyên li ber destê min, sunetkirina keçan bêhtir li aliyê gundan pêk dihat.

Pir eşkereye ku, sunetkirina keçan, pêlîkirin û nenaskirina mafê jinan e, û suc e. Divê sunetkirina keçan qedexe bibe û sunetkirina keçan weke suc bê hejmartin û dîtin. Pêwîst e xelk, bi rêya kampanyayên pir alî, li ser pirsê bêne ronîkirin. Hêzên lîberal yê li Kurdistanê, dikarin ji bo rawestandina suneta keçan rolek erênî bilîzin. Pêşniyarên min ji bo Hikumeta Herême ew e ku, çalakiyên xwe yê li dijî sunetkirina keçan eşkeretir û zêdetir bikin. Pirsê bîhênin rojeva xwe, û weke pîrsek sereke bibînin û çareser bikin.

Pêşketinên erênî li Herême

- Germa gilobal û guherînên klîmatê pîrsek sereke ye û li cîhanê pir cidî tê dîtin. Li Herêma Kurdistanê rewş çawa ye?

Jabar Amin: Germbûn û guhertinên avûhewayê (îklîm, klîmat) ya giloverî bandorek giran û neyênî li Kurdistanê dike. Germbûn herku diçe zêdetir dibe û tehemûla mirovî kêmtir dike. Bahozên qûmê pêk tên û bandorê li jiyana rojane dikin. Bahozên wisa çenedibûn, anjî pir kêmtir dibûn. Gelek ji kaniyên avê zuwa dibin anjî ava wan kêmtir dibin. Çandinî bi dijwariyan re tê hemberî hev...

Divê li hemberî guhertinên avûhewayê li Kurdistanê, planek xurt hebe û pêk bê. Ji bo vê jî polîtîkayek pir aktîv pêwîst e. Mixabine ku plan û polîtîkayek wisa li Kurdistanê tune ye.

- Ji me re qala pêşketinên erênî li Herêma Kurdistanê bike...

Jabar Amin: Kurd li başûrê welêt îdareya xwe bi destê xwe dikin. Ji zexta rejîma navendî ya Iraqê azad bûne. Başûrê welêt hêviyek mezin dide beşên din yê Kurdistanê. Li Herêma Kurdistanê partiyên muxalîf dest bi xebatê dikin. Hebûna muxalefetê bandora xwe ya erênî li ser rêvebirên Herême û guhertinên demokratîk heye. Pêşketinên wisa dê sudên pîralî bighêjîne xelkê...